Xapandina hozanê û...

Ehmed Yasîn Bendî

Ji ber ku hozan li gel nax û wijdana mirovayiyê jiyaye û vejen bûye û hokarek e bo peydakirin û hilêvirîna gelek regez û tuxmên din di edebîyatên mirovayiyê de mîna; peydakirina hunerê terajîdî û komêdî, ku her bi rêka hozanê bûye. Carê, em li gel gewher û hebûna wê ne, lê danîna hukmekî reha li ser hozana ku îro dihê nivîsandin, reng e karek ne asan be, belê em dê vê pirsê bikin û herweha dê bersivê jî bidin. Em dê niha bikevin di nava çeperê xweragiriyê de ji vî tuxmî ji bona weşandina gelek sertîr û riman bo sîngê hozana niha, rast e ku hozan heye û dihê nivîsandin, lê bi çi terzî ye? Dikare çend xwe di nava xwîna mirovn de bişêle û rengvedana xwe hebe û karên nû ji mirov re çêbike? Û em kîjan berhemî bi hozan bi nav bikin? Ev pirsa herî giring e.

Lê, çunkî hozana îro terzek nû ye û pêvajoyek nû hembêz kiriye, li vê derê ji aliyekê ve em bi delîve dizanin ku mifayî ji vê guhorînê bikin û wekî xwe binivîsin û bibêjin ev e nûjenî ye!

Hîngê, bi rastî, me xwe xapand. Lê, ew kî ye weha serederiyê dike? Ew e yê ku tu nikarî nivîsandinên wî wek berhemekê hozanî nas bikî, belê berevajî vê yekê jî rastî xuya dibe.

Ez dixwazim li vê derê du xalên here serekî bidim nasîn, ku hozana îro pê dihê xapandin û şepilandin, ew jî çavlêkirin û nav e.

Mirov → nivîsîn → xapandin → veman → mirin

Mirov → Huner → hozan → vejandin → hebûn → xwedîtin

Hostayî — Rewşenbîrî, ketwar

Ciwanî rastî dahênan → hozanvan

Ji ber ku hozanê bi hemû raman û wataya xwe ve serkêş û dîvelank bi xwe ve dîtine û ji ketwarê hozanê derneketine, dibe berhemekî hozanî dihê meydanê. Bi gotinek din, dibe ku berhem bêhna hozana hevçerx bide û di heman demî jî de dibe ku nivêsîn, her çî sîma û rengên hozanê ne ji dûr ne ji nêzîk dide û ez vê yekê qenc nabînim.



Li vir, eger em li naverok û sitîlê hozana îro binêrin û bibêjin çima me nav lêkir hozan? Çunkî xala here serekî girêdayî rîtm û serwayê ye, carê me serwa ji dest da, lê jidestdana rîtmê jî di heman demî de, ev e wê ji qalib û hunerê hozanê derdixe. Ya îro, hinek cara dihê nivîsandin carê hunerê hozanê ji dest daye, li gel sitatîkayê û wêne û rastiya ketwarê hozanê. Lewma jî, ev yek dibe guneh û nabe navê hozanê li ser her nivêsînekê were danîn, ku niha bi dehan nivîsîn hene bi vî navî werin nav kirin, ev yek jî li gor dîtina min guneh e û divê aliyên berpirs bihên dadgehkirin.